

Li 25. Çiriya paşî 2018

# NA JIBO „DESPÊŞXERÎYA BIXWEBIRYARDANA“ SVP'Ê YA TIRSÎNAK



„Ez dibêjim NA jibo hêrişa sing-û-sing li ser paraztina mafê mirovî û mafên kar. Destpêşxerî dixwazê, ko Swîsra bikaribê ebelênên xwe yên navneteweyî biştgwêh bikê, herwekî ev desthilatdarên zordest dikin. Ez evê na pejirênim.“

Ömer Resitoglu, Endame SP Bern,  
Endame Navenda Canda Demokratik  
a Kurdan Bern



„Ez dibêjim NA jibo pişgwêhkirina peymanên navdewletî. Tenha peymanên welatan und mafê gellan welatên biçûk wekî Swîsra ji siyaseta hêzê û zilhêzan diparêzin, Bêyi evana desthilatdarên wekî Trump, Putîn û Erdogan, biryarê didin, bê ka çî li Cîhanê divê biqewimê.“

Margret Kiener Nellen,  
Perlementera federal, Bern



„Ez dibêjim NA jibo bêparaztina mirovan ji zordariya dewletê ya bêwijdan. Mafênmirovî yên navdewletî me hemmiyan ji zordariya dewletê ya bêwijdan li ser azadiya me diparêzin. Destpêşxerî evan mafan dixê metrisiyê.“

Ihsan Kurt, Ji'ngirê Serokê SP, Serokê Komisyona integrasyonê û koçberiyê, Sosyolog, li Lozanê diji.

## NA JIBO JIBO HÊRÎŞA SING-Û-SING LI SER „PARAZTINA MAFÊ MIROV“:

Ev destpêşxerîya hanê hêrîşeke SVP'ê ya sing-û-sing e li ser paraztina mafê mirovî. Bivêna li wir bitenê ranawestê. Li seranserê Cîhanê welatên sitemkar û desthilatdarên gendel jiber berjewendên xwe bixwe Qanûna Gellan binpêdikin. Her îro danpêdana belênên-mafênmirovî ya aliyê Swîsra'ye ji her demê pirtir giring e. Em nikarên destûrê bidin, ko Swîsra belênên-mafênmirovî ya xwe biştgwêh bikê, herwêkî welatên sitemkar û desthilatdarên zordest evê dikin.

## NA JIBO PIŞTGWÊHKIRINA PEYMANÊN NAVDEWLETÎ:

peymanên welatan û Qanûna Gellan welatên biçûk wekî Swîsra ji siyaseta hêzê ya zilhêzan diparêzin. Hinek ji evan berdeyam nijadperesttir dibin. Her jiber evê yekê û niha eva henê ji Swîsra're hêj giringtir e, pîvanên navdewletî biparêzê û hişyarê ewan bê. Pergeleke maf ya bihêz tenê dikarê rê li zordariya dewletê bigrê. Bê pîvanên navdewletî desthilatdarên wekî Trump, Putin û Erdogan, biryarê didin, bê ka çî li Cîhanê divê biqewimê. Lewma NA jibo evê Destpêşxerîya-SVP'ê ya tirsînak.

## NA JIBO BÊPARAZTINMAN JI ZORDARIYA DEWLETÊ RE:

mafênmirovî yên navdewletî me hemmîyan ji zordariya dewletê ya bêwîjdan li ser azadiya me diparêzin. Mafên Gellan û di sêrî de Lihevkirina mafê mirovî ya Ewropî (EMRK) mafê niştecihbûnê tekez dikan, mafê zarokan, li gel malbata xwe bijîn, û paraztina wan ji girtinên bîzorê û der-sinorkirnan. Ev destpêşxerî evan destekvtan hemmîyan dixê ber pîrsê. Lewma em dibêjin NA.

## EZ ÇAWA DENG BIDIM?


KURDISCH



Nameyê vekin



Rûpela dengdayînê dabigirin




Rûpela dengdayînê têxe zerfê û bigre



Nasnameya dengdayînê imze bikin



Zerfa dengdayînê û nasnameya dengdayînê têxin zerfa mezin ya ji bo şandinê



Li dawiyê zerfê herî dereng heta 17.11. bi reya postê ji şaredariyê re bişînin yan ji heta herî dereng 24.11. têxin qutiya postê ya şaredariyê

## WELATIYÊN SWÎSRE YÊN DIÇIN DERVEYI WELAT DIKARIN BIKEVIN BI TESIRE

Di salên dawî de, bi qasî milyonek mirov bune himwelatiye Swîsrî. Li derdora 880 hezar welatiyên Swîsre li welateki din bune xwediyê nasnamak din. Eger kesên wisa tevî dengdanê bibin, hingê ev înişiyatî wê neyê qebulkirin. Na ji bo înişiyatîva Pêkanîne ya dijmîrovî, mumkune, bi tenê dema ku em dengê xwe bikarbinin.

Têkelî: SP MigrantInnen, Postfach 7876, 3001 Bern, Tel. 031 329 69 69  
info@spschweiz.ch, www.spschweiz.ch/migranten  
PS Migrant-e-s, case postale 7876, 3001 Berne, téléphone 031 329 69 69  
info@pssuisse.ch, www.pssuisse.ch/migrants

